hebe, em xwedî dîrok bin û pêwîste em li dîroka xwe bigerin, bidin hev û tomar bikin. Bêguman, ew Feqe, Mele û Şêxên ku di hicrik û tekiyan de destxetên wek dîwana Melayê Cizîrî, Mem û Zîna Şêx Ehmedê Xanî, dîwana Feqeyê Teyran, Nehcîlenama Mele Xelîlê Sêrtî ji bo me parastin û pêre jî zimanê me parastin, ew peşek in ji dîroka me. Di bawerîya min de, roja îro li gor derfetên ku ji me kurdên Rojava re hene, parastina navê wan, parastina ziman û beşekî ji dîroka me ye. Di vê mijarê de, wek a ku berî çend rojan min li dor Mele Îbrahîmê Tilşîrî belav kir, bi min xweş e ku îro jî, ez Seydayê Hecî Mûsa bi

Şêx Seydayê Hecî Mûsa (1883 – 1963)



we bidim naskirin.

Seydayê Hecî Mûsa kî ye?
Ji şêxên rêçika Neqîşbendî

yên naskirî ye, bi koka xwe jî malbata Seyidên Bêcirmanî ye. Ew di sala 1883 an de li Kurdistanê bakur çêbûye, li pey xwendina olî di gelek hicrik û dibistanên olperestiyê de xwendiyê. Piştî ku xwendina xwe bi serketin bi dawî aniye, wek Melakî 12 ilmî li beriya Mêrdînê meletî kiriye û feqe perwerde kirine. Nexasim li gundê Nicim ku dor 30 feqeyên wî hebûn.

Paşê, bûye yek ji xelîfeyên Şêx Ehmedê Xiznewî û di nav kurdên Serxet û Binxetê de hatiye naskirin. Di pey re, ji ber hin probleman di navbera wî û mala Şêx Ehmedê Xiznewî de,

wî bi tena xwe rêçika Neqîşbendî ji gundê Sîha Mivred bi rêve birîye û belav kiriye û wiha gelek murîd û sofiyên wî ji kurd û ereban çêbûne û gotina şêx li navê wî zêde bûye û jêre hatiye gotin Şêx Seydayê Hecî Mûsa.

Ew di 13 sibata 1963 an de li gundê xwe Sîha Mivred, ku 30 Km başûrî Qamişlo dikeve, koça dawî kiriye û lê hatiye veşartin.

Şêx Seydayê Hecî Mûsa ji şêxên Kurdan yê Kurdperwer bû. Xwedê wî bi dilovaniya xwe şad bike.

Konê Reş, Qamişlo,
10.02.2015

Şêx Behyeddînê Zîlanî Birayê Şêx Xalidê Zîlanî Şêrên Geliyê Zîlan bûn

Piştî hilweşandina împaratoriya Osmanî û guhertina wê bi Cîmhuriya Kemalî di sala 1923 an de û bi taybetî piştî serhildana şêx Seîdê Palo di sala 1925 an de û bidarvekirina wî û her 47 şêx û axayên Kurdan yê pêre, Kemalistan bi hovîti berê xwe dan şêx û axayên Kurdan yê mayî; Ji berê ve, ew girtin, kuştin û sirgûnî Anadola rojava kirin û pêre jî tev tekî, hicrik û dibistanên olî yê wan şêxan girtin. Vêca, ew şêx û ronakbîrên ku ji ber destê Kemalistan filitîn û yê ku jiyana wan di metirsiyê debû, ji neçarî Kurdistanê bakur li paş xwe hiştin û berê xwe dan nav Kurdên Binxetê û bi taybetî

bajarê Amûdê ye ku ji kevntirîn bajarê Cizîrê ye û bajarê Qamişlo ye ku nû hatibû avakirin. Ev herdu bajar û Beriya Mêrdînê ji sedê salan ve bi bajarê Mêrdînê ve girêdayî bûn. Wê hingê Binxetê di bin desthilatdariya Fransîzan de bû. Vêca gelekên ji şêx, mele, zanyar, rewşenbîr û axayên Kurdan xwe li bajar û gundên Beriya Mêrdînê girtin, bîr û baweriyên xwe wek ku dixwestin berde-wam kirin; Mizgeft, tekî û hicrik avakirin. Yek ji wan kesên ku hatin Şêx Behyeddînê Zîlanî bû. Şêx Behyeddînê Zîlanî, birayê şêx Xalidê Zîlanî bû, ji Şêrên Geliyê Zîlan bûn. Piştî komkujîya geliyê Zîlan, Kema-

listan malbata Şêx Xalidê Zîla ji sirgûnî Anadola rojava kirin. Di sala 1948an de şêx Behyeddîn bi herdu biraziyên xwe şêx Ebdulqidûs û şêx Mihemed kurên şêx Xalid digel zarokên xwe binxetî beriya Mêrdînê bûn. Destpêkê, hatin gundê Dadûşiyê, piştî pêleke nedirêj, çûna Şamê, xwe li welat-parêzen kurdan wek Mîr Celadet Bedirxan, Osman Sebrî û yê mayî girtin. Li Şamê şêx Ebdulqidûs çûye ber dilovaniya Xwedê û şêx Mihemed ziviriye welatê xwe Geliyê Zîlan. Şêx Behyeddîn jî, careke din ji Şamê zivirî Cizîrê û li gundê me Doda, mizgeft û tekiyek ava kir û dergehê tobe û tewacê vekir.

Murîdên wî bi pirranî xelkên Amûdê, xelkên beriya Mêrdînê, Mehçir û Miqriyên Doda bûn, digel xelkê gundên Gundik, Tilkêfê û Olçiya bûn. Xelîfeyê wî li Doda Xelîlê Hecî bû, li Gundik Ferhanê Çelebî bû û li Olçiya jî İzzeddîn bû, û bi navê Şêxê Doda hat naskirin. Vê paşiyê ji ber berberîya di gund de, mal û tekiya xwe guhest bajarê Amûdê û ta niha mizgefta Şêxê Doda naskirîye. Piştî Amûdê, pêlekê li gundê Hazdê û bajarê Heskê jî maye û careke din mala xwe barkirîye Şamê. Berî dor 45 salan ji niha ve, ji Şamê ziviriye Diyarbekirê û piştî vegera wî bi dor 5/6



salan çûye ber dilovaniya Xwedê û li goristana Diyarbekirê a li Seyran Tepe, ser rêka Farqînê hatiye veşartin. Rehma Xwedê li canê wî bibare.

Konê Reş, Qamişlo,
12.02.2015



Hacı
Paşa
Ağaoğlu

Xoşqêdêr Cêbrayîloğlu
Qem ûstê köklendin Cêbrayîloğlu
Qismet sêne gêlib belê neylêyek.
Zülüm sêne tek olsaydı ne derdin,
Amma gêlib bütün elê neylêyek.

Hêr sêtrin elden gêlen bir sêdi,
El sevmeyin namus qeyret hêvêdi.
El ayağın yurd-yuvadan kim kêdi,
El qarğısın düşsün selê neylêyek.

Tariximde êrenlerin biri sên,
Yazdıgınla sên ebedî dirisen.
Dêrdli qêlbê sığınacaq yerisen,
Qeyri bilmêz yada biler neylêyek.

Mêşed Êli oğlu dayî Qenimê
El obada sayıladı qenimê
Yaxşılıqlar edib vurmazdı minnê
Hüquqşunas elminde var ad sanı
Şanşöhreî gôtürmüşdü her yanı

El obada Qenimê bir êrendi
Hêr bir işi pak vicdanla görendi
Sêdeqeni zêhmêrinden verendi
Êqidêsi düzliylê qoşadı
Mêğrurluğu hêyatıylê başadı.

Polad kimi êyilmêye yad oldu
El şad olsa oda hêmen şad oldu
Bütövlüyê bir nûmûe ad oldu
Şexsiyyetîn bütövlüyün saxladı
Pisliklêri yaxşılıqla haxladı.

Dayım mênim

Dayaq sözündendi dayî kelmêsi.
Hêyatda dayagım bu dayım mênim.

Dar günde hêmişê êlimden tutan.
Xoş günde günêşim hêam ayım mênim.

Hêyatda deyêcek mênim sözümdür.
Dünyaya baxacaq mênim gözümdür.
Varlığı nêtinlik hêmdê dözümdü,
İxtiyar olsada genc sayım mênim.

Hêam ilim hêam günüm hêmdê anımdır,
Güşümdê üreyim canda qanımdır.
Murovum Kêpêzim mênim canımdı.
Vüqarda oxşarı Kür çayım mênim.

Cizbeya Evîne

Ji mêjde
derdê te dîkeşim
çawa şev
derdê qeflên tariyê
dikşîne
çawa roj
di bin bazkên xwe de
derdê hêwirandina
perçemokê dikşîne
çawa jinek
her serê heyvê
derdê rijandina
xwîna mirî dikşîne.

Tu bi sanciyar re tê
wekî sehmasiyekî

qîlên xwe
li komerîşka
stêrkên min didî
wan yeko yeko
dadiqurtîni
çima tu yê bibî
pîjê ber diranê
maceryên min
û leylana min î
bi çolan şuştî
biçikîni.

Kembera li ser newqa min
dibriqe
ji evîne badayî ye
êdî te nakim kilçiv
min çavê xwe

ji kildanê ezmûnê
kildaye
Keştiya min î
bi ber bayê arezûyên te diket
û bi ser kelexê xwe de
li ber peravên te
hildiweşî
niha di zerya xwesteka min de
avjenî dike

Eger tu dixwazî werî
werî...
lê kum û kolozê xwe dîne
cîhana min bê dergehe
ban û zemînê xwe nîne
ji bo tu bibe berdilkê min
ji tac û eywan

şûr û mertal re
cih nîne.

Ne wek aviyekî
xwe bavêjî nav
keriya min
ne wek xwîniyekî
xwe bavêjî bextê min
û ne wek zarokan
xwe bavêjî kirasê min
di ferhenga evîne de
cih ji lavan re nîne

Ji bo em bi hev re
stêrkan bi hejmêrin
bikin ristik
diyarî ji xwedawenda



Dilşa
Yûsûf

evîne re
divê em bibin
tayê wê yî ji eşqê ristî
û di cizbeya evîne de
li ber dergehê
perestgeha wê
bi dilovanî serî dînin.

Têkoşîna azadîyê di 90 salîya serhildana neteweyî ya 1925an de jî berdewam e.

Serhildana 1925an ya Kurdistanê di 13.02.1925 an de destpêbibû. Rêxistina Azadîyê jibo di Newroza 1925 an de serhildanêkê lidar bixe amadekarî dest pê kiribû. Dewleta Tirkîyê jî vê amadekariyê agahdar bû. Û jibo ku rê li ber vê bigire, Serokê Rêxistina Azadîyê Xalid Begê Cibrî hate girtin û jî aliyê Dewletê ve hate darvekirin. Paşê jî jibo serhildan bêtî ku amadekarî temam bibin bê dest pê kirin, provakasyonêk jî aliyê dewletê ve hate tertîb kirin û serhildanê jî wexta tesbît kirî zûtir dest pê kir.

Piştî girtina Xalid Begê Cibrî û piştî ku serhildan bi awayekî bê wext destpêbû, Şêx Seîd wek serokê serhildanê derket pêş.

Serhildana 1925an ango Serhildana Şêx Seîd, yek ji tevgerên herî girîng ên Rizgarîxwaz û Neteweyî yên Bakurê Kurdistanê ye. Şêx Seîd di nava gel da piştgiyêke mezin stand û hejmarek

90 saliya serhildana netewî

gelek ji xelkê di nava tevgera rizgarîxwaz de cîh girt. Jiber vê yekê jî, êdî ev tevger bi navê Şêx Seîd hate bi lîv kirin û yadkirin. Gelê Kurd û Kurdistanê, hêşir bûn qebûl nekiriye û di dîroka xwe de gelek caran jibo azadîyê serhildaye. Û di sala 1925an de ango berî niha 90 salan jî bo mafên xwe yê netewî xelekek din li ser zîncîreyên berxwedana mafê xwe zêde kiriye, li himber zilma li Kurdistanê serhildana xwe da destpêkirî ye. Ev tevgera di demeke kurt da belav bû û piştgiyêke mezin ji xelkê Kurdistanê stand, gelek bajar û bajarokên Kurdistanê bi dest xist û hêvî yê rizgarî ya netewî şî kir.

Mixabin jî ber êrîşên dijwar ên hêzên Dewleta Tirkîyê û hinek sebebên din, tevger têk çû, bi hezaran Kurd hatine kuştin, qetl kirin. Şêx Seîd û bi dehan

rêberên tevgerê hatin darvekirin. Ew şikestin di heman demê de bû dîroka

bi awayekî girseyî tê meşandin. Ev pêvajoya nû dibe destpêkek jibo ku ji nûve nivîsîna dîroka gelê Kurdistanê û bi dest xistina mafê wî yê rewa. Êdî çerxeye nû destpêdike. Bi hêviyêke mezin û bi biryarî em ê hewl û têkoşîne bidin ku vê çerxa nû ji gelê Kurd û Kurdistanê re bibe dahatûya azadîyê.

Bi van hestan, bi minasebeta 90 salîya serhildana neteweyî ya 1925an, em Şêx Seîd û hevrê yê wî û hemû şehîdên Kurdistanê bibîrtînin, bejna xwe li ber wan ditewînin. Em dixwazin îtibara Şêx Seîd, Seyîd Rîza û Seîdê Kurdî paşve bê vegeandî û cihê qebrên wan bîn eşkere kirin.

13.02.2015
Buroya Çapemenî û Ragehandinê ya Partiya Azadîya Kurdistanê (PAK)



surgun kirina kurdan jî.

Lê têkoşîna doza azadîya Kurd û Kurdistanê nerawestîya ye. Gelek serhildan lidarketine. Û îro jî ev têkoşîna

Mesrûr Barzanî: Niha pêwîstiya me bi çekan heye..Pêwîst e peydakirina çekan bibe karê serke yê Amerîkayê

hilwasîn." Mesrûr Barzanî got: Birastî dema terorîstên DAIŞê xwestin zextê li Hewlêrê bikin Kurd rastî şokê hatin lêbelê Kurd karî bilez xwe amade bike û



Hêzên Pêşmerge jî bilez karî pêşewî bikin jiber ku Serkirdeyên wan karî peywendî ligel hevpeymanîya cîhanî ya li dijî DAIŞê çê bikin û bi vî rengî Kurd karî terorîstên DAIŞê li Hewlêr, Mexmûr, Rebîe û sînorên Sûriya û piraniya deverên din yê parêzgeha Neynewayê dûr

bixe. Lê serkeftin astengî jî li gel xwe tîne, kengî dawî bi şerê rizgarkirina Mûsilê tê? Kurd naxwaze vê bike, Kurd kariye piraniya wan deveran ku jî aliye DAIŞê ve hatibûn dagîrkirin rizgar bike û Kurd dizane şandina hêzên Kurdî bo bajareke sune y a Ereban weke Mûsilê vê kêşeyên siyasî li gel xwe bîne, artêşa Iraqê û çekdarên Şîi û sune di prosesa perwerdehî dene û hîn jî bo ew şera han ya mezin ne amade ne û Obarak Obama jî şandina hêzên bejayî bo Iraqê bidûr dizane. Kê Mûsil azad dike? Mimkunê bo demekî kes nikaribe lêbelê Mesrûr Barzanî di vî derbarê de dibêje: "Eger hun dixwazin ew şerê han bo çend salan bidome vê demê demeke baş li ber destê we de ye bo perwerdekirina artêşa Iraqê lê di dema perwerdehî de vî derfet jî DAIŞê re tê dayîn daku dubare xwe organîze bike û zêdetir xwe pirçêk bike, ji ber ku DAIŞ jî her wisa ranaweste."

Şewirmendê Encûmena Ewlekariya Kurdistanê sedema vî yekê jî şîrove dike ku çima DAIŞê dijmîneke metirsî-dare û dibêje: "Baştirîn çekê destê terorîstan tirimbîlên bombekirîn e meha

derbasbûyî tenê di rojekî de 14 tirimbîlên bombekirî bo ku bi Hêzên Pêşmerge bîteqînîn şande eniyên şer, di şerê de gelek tundrewin piraniya wan terorîstên Çeçanî, Qezaqî û Ozbekistanin, xweteqandin cem wan baştir ji xwe teslîm kirinê jiber ku ew xwekojin han wisa dizanin ku li cenetê de vî hurîyan bidin wan." Mesrûr Barzanî herwiha eşkere kir ku terorîst di nava xwe de jî xwedan kêşê û arîşene, ew terorîstên biyanî yê ku ji wan re Muhacirûn tê gotin ji pere û jinên ku dikevin destê terorîstan xwedan parê şêrên (parê herî zêde yê wane), lê terorîstên navxweyî jî yê ku bi Ensar tîne nasîn ji vî yekê nerazîne, li hember ew kesên ku xiyaretê bike gelek acizin, her kesek ku bixwaze ji Mûsilê derkeve dibe gerentî anjî keffîlek dane daku eger venegeriya ew keffîl di şûna vî de were kuştin. Bo parastina Kurdistan û Iraqê ji terorîstên DAIŞê heta ku Amerîka artêşa Iraqê amade dike, amerîka piştî xwe bi hêzên Kurdî dibeste, ew yek jî bûye sedem da ku Mesrûr Barzanî amaje bi girîngtirîn xal bike û ev jî ewe ku Kurd bilez pêdiviya xwe bi çek heye bi taybetî çekên Amerîkayî bo parastina Hêzên Pêşmerge

Elî Ewnî: PKKê li vir dimîne da ku hêncetê bide dagîrkerên Kurdistanê.. Erkê wan bi dawî hat

Şêxan-KDP.info- Berpîrsê liqa 20 ya Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) li Şêxanê Elî Ewnî tekez kir ku, her kesek li Herêma Kurdistanê di şerê li dijî DAIŞê de şehîd bûye mafê wî heye ku wek şehîdê nîştîman were hisabkirin. Herwiha derbarê vekîşandina gerîlayên PKKê ji Başûrê Kurdistanê dibêje, balek di nava PKKê de heye ku bi destê xwe û bi îradeya xwe nagere, lê belê di bin berjewendiya xelkên din û bi fermana xelkên din digere, dema ku behsa vekîşandinê jî dikin nerastîyê mezin tê de ye. Elî Ewnî Endamê Serkirdayetîya PDKê û Berpîrsê liqa 20 ya PDKê li Şêxanê jî malpera KDP.info re veneşart ku balek di nava PKKê de heye ku ku bi destê xwe û bi îradeya xwe nagere, lê belê di bin berjewendiya xelkên din û bi fermana xelkên din digere.

Herwiha di wê baweriyê de ye ku, "Dema ku behsa vekîşandinê ji Başûrê Kurdistanê jî dikin nerastîyê mezin tê de ye, ku dibêjim em li ser daxwaza hemû xelkê li vir in, lê raya xelkî jî tenê

ya 2-3 kesên ser cadeyê ye."

Berpîrsên PKKê di çend rojên borî de daxuyanî dan ku ew naxwazin li Başûrê Kurdistanê bimînin û dê vekîşin, lê Elî Ewnî dibêje: Ew li vir dimînin da ku hêncetê bidin dagîrkerên Kurdistanê, ku leşkerên xwe bînin ser sînorên me, bi taybetî jî niha em di qonaxê çarenivîsaz de ne û gellek nemaye ku em rizgar bibin, ew jî dixwazin rewşê aloz bikin û derfet û hêncetê dide destê dagîrkeran da ku bînin nava Kurdistanê.

Ewnî wiha domand: "Ev yek gilî û daxwaza Herêma Kurdistanê ye ku divê vekîşin, lewma neçar man ku bîjin belê emê vekîşin, lê eger gel ji me bixwaze. Gel kî ye? Gel li cem wan 2 - 3 kesên nêzikî wan in? Vê hemû hikûmetê red dikin û rêzê li destkeftên me nagirin. Bi xwe tîne ser careyê û dibêjin va gel naxwaze em vekîşin. Ev lîsê pir kevn e."

Elî Ewnî wiha got: Miletê me beriya 6 - 7 mehan hilbijartinên xwe kirin û nûnerên xwe diyar kirin, lewma dive hikûmet û parlamentoya Kurdistanê wê biryarê

bidin, ku ew li vir bimînin yan jî herin. Nabe xwe bi ser dezgehên Herêma Kur-



distanê xwe feriz bikin.

Ewnî ragihand: "Ez bawer nakim ku, ew hejmara wan ya kêmtir ku li Başûrê Kurdistanê ye, karibe ti şere û hevsergiyêke yekalîker bike. Dema ku amadebûn pêwîstiya Kurdistanê bi wan hebû. Ez jî kesekî sivil im, min çek helgirt û min

şer kir û çend mehan li eniya şer bûn. Wê demê pêwîstiya Kurdistanê bi me hebû. Niha rewş asayî bûye û ez jî ne li şer im. Dema erkê me bi dawî hat me xatir ji Hêzên Pêşmerge yê li eniya şer xwest û ez vegeriyam navenda xwe." Berpîrsê liqa 20 ya Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) li Şêxanê Elî Ewnî tekez kir ku, "Her kesek li Herêma Kurdistanê di şerê li dijî DAIŞê de şehîd bûye mafê wî heye ku wek şehîdê nîştîman were hisabkirin, ew şehîd çî ji Bakur be, çî ji Rojava û Rojhilatê Kurdistanê be." Derbarê meydana rastî ya xebata PKKê û xweferizkirina li ser Başûrê Kurdistanê, Elî Ewnî wiha got: "Niha dema yekxistina setretejiyeta gelê Kurdistanê ye, ku ne kêmtir serxwebûnê ye. Divê di dema vî xwena dêrîn de, gelê kurd aloziyan ji xwe re dernexe û bi rastî mafê gelê xwe bidest bînin û asta nîştîmanperweriyê ya gelê Kurdistanê bilind bikin." Elî Ewnî wiha domand: "Em jî rêbaza Barzanîyê nemir fêrî canfedayiyê bûne, fêrî xweferizkirin û înkara xelkê nebûne. Niha erkê wan bi dawî hatiye û dive ji Başûrê Kurdistanê vekîşin." **kdp.info**

Heyeta Parlamentoya Kurdistanê Li Gel Partiyên Bakur Civîyan

Heyeta Parlamentoya Kurdistanê îro (12.02.2015) li Amedê bi partî û sazîyên Kurd û



Kurdistanî re civîneke hevdu naskirinê û danûstendinê pêk anî. Heyeta Parlamentoya Kurdistanê ji Elî Halo, Salar Mehmûd, Mihemed Elî Yasîn Taha, Êvar Îbrahîm, Necîbe Letîf Ehmed, Kemal Yelda, Behar Ebdulrehman, Perwa Elî Heme pêk hatibû. Partî û sazîyên ku beşdarî civînê bibûn ev in: PAK, HAKPAR, KADEP, TKDP, PDK Bakur, ÖSP, Hereketa Azadi, DDKD, Tevgera Îslamiya Gel. Heyeta Parlamentoya Kurdistanê, sedema ziyareta xwe, wek pêşde birina dan û stendinê di navbera Başûrê Kurdistanê û yê Bakurê Kurdistanê îfade kirin. Heyetê grîngiya yekitiya neteweyî anî zimanî û got "Em dixwazin di warên kulturî û civakî de ji têkiliyên xwe pêş de bixin." Beşdarên civînê yên partî û sazîyên Bakurê Kurdistanê jî, her yek li ser navê partî û sazîyên xwe, di derbarê yekitiya neteweyî û dan û stendinê her du perçeyên Kurdistanê de bir û rayên xwe anîn zimanî. Hevdu dîtina Heyeta Parlamentoya Kurdistanê û partî û sazîyên Bakurê Kurdistanê di atmosfereka germ û welatperwerane de derbas bû.

Pentagon: Emê zêdetir alîkariya Pêşmerge bikin... Serkeftinên baştir bi dest dixin

Hewlêr-KDP.info- Wezareta Parastinê ya Amerîkayê (Pentagon) ragihand ku, Hêzên Pêşmerge bi alîkariya operasyonên asmanî yên hevpeymanîya havdewletî li nêzik Bendava Mûsilê, çekdarên DAIŞê neçar kirin ku paşve bikişin. Pentagon di daxuyaniyekê de ragihand: "Li rojhilatê Mûsilê 3 pîrên li ser ava Dicle ku di destê DAIŞê de bûn ji aliyê Pêşmerge ve hatine kontrolkirin." Li gor heman daxuyaniya Pentagonê, rayedarên Amerîka dibêjin di hersê rojên borî de Hêzên Pêşmerge bi alîkariya balafirên hevpeymanîyê êrişên serkeftî pêk anîne û ziyanên mezin gihandine DAIŞê. Herwiha hat gotin ku şewirmendên Amerîka bi awayekî berdewam alîkariya Pêşmerge dikin û zaniyariyên îstixbaratî didin wan. Pentagon herwiha balê dikişîne ku ji ber wan zaniyariyên îstixbaratî, îmkanên Pêşmerge zêdetir bûne û di operasyonên li dijî DAIŞê de serkeftinên baştir bi dest dixin. Wezareta Parastinê ya Amerîka behsa serkeftinên Hêzên Pêşmerge dike û dibêje: "Ew mîna keke din e ya şikestina DAIŞê û asta alîkarî û hemahengiya navbera êrişên asmanî û şewirmend û hêzên bejayî."

Hêzên Pêşmerge li eniya Xazerê bi tundî bersiva DAIŞê dan

Xazir-KDP.info- Fermandarê Hêzên Pêşmerge li eniya Xazerê dibêje, vê şevê terorîstên DAIŞê êriş kirin ser çeperên Pêşmerge, lê Hêzên Pêşmerge bi tundî bersiva wan dan û êrişa wan tîk birin. Seyd Hejar Fermandarê Hêzên Pêşmerge li eniya Xazerê ji malpera KDP.info re ragihand: "Vê şevê terorîstên DAIŞê li gundê Hesên Şamê eniya Xazerê êriş kirin ser çeperên Pêşmerge, lê her zû Hêzên Pêşmerge bersiva wan dan û êrişa wan tîk birin û wan terorîstan gellek ziyan dîtin." Wî fermandarê Pêşmerge wiha domand: "Di wê êrişê de, gellek çekdarên DAIŞê hatin kuştin û birîndarkirin, lê ji ber ku şev e em nizanin hejmarê kuştîyên wan çend e."

Serokê Awusturya tekez li ser piştevaniya welatê xwe bo Kurdistanê û pêşkêşkirina alîkariyên mirovî diyar kir

Awusturya-KDP.info- Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî û Serokê Awusturya civiyan û di wê hevdîtinê de Serokê Awusturya tekez li ser berdewamiya palpiştiya welatê xwe ya ji bo Herêma Kurdistanê û pêşkêşkirina hevkarîyên mirovî kir. Duhî li bajarê Viyenna Mesûd Barzanî Serokê Herêma Kurdistanê ji aliyê birêz Heinz Fischer Serokê Awusturya (Nemsa) ve hate pêşwazî kirin.

Li kombûnê da ku li keş û hewayekî dostane da birêveçû êrişên terorîstan û rewşa niha ya Kurdistanê û her wiha paşaroja Kurdistanê û navçeyê û rola Kurdistanê xistin ber behs û guftûgoyan.

Herwiha Serok Barzanî li axaftinek da û tîşk xiste li ser berdewamiya palpiştiya welatê xwe ya ji bo Herêma



serkeftinên Pêşmerge û Kurdistanê û pêşkêşkirina hevkarîyên mirovî kir. Li mijareke dinê vê civînê de her dû alî di derbarê paşaroja Suriye û rola Kurd

Serokê Awusturya tekez li ser

ya li paşaroja Sûriyê danustandina bîr û ramanan kirin.

Berî destpêka vê hevdîtinê li civîneke rojnamevaniya hevbeşa di navbera her dû Serokan de, Serokê Awusturya bi germî bi xêrhatina Serok Barzanî kir û her wiha behsa peywendîya kevnare ya Awusturya û gelê Kurdistanê û dostayetiya xwe ya kevin ligel cenabê Mam Celal û Serok Barzanî kir. Her li vê civînê rojnamevaniyê de Serokê Awusturya behsa girîngiya serdana Wezîrê Derve yê welatê xwe ya ji bo Herêma Kurdistanê kir.

Hêjayî gotinê ye ku piştî civînê, Serok Barzanî ji bo firavîne mîhvanê Serokê Awusturya bû.

Sibe Nêçîrvan Barzanî diçe Bexdayê

Bexda-KDP.info- Wezîrê Dewletê li Hikûmeta Iraqê Saman Ebdulah ragihand ku, sibe Serokwezîrê Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî û şanda pê re serdana Bexdayê dikin. Herwiha ew serdan jî bi bandor bo çareserkirina arîseyan û şandina pişka Herêma Kurdistanê ji budceya Iraqê da zanîn.

Saman Ebdulah Wezîrê Dewletê li Hikûmeta Iraqê ji malpera KDP.info re ragihand: "Sibe şandeke pilebilind a Herêma Kurdistanê bi serokatiya Nêçîrvan Barzanî tî Bexdayê. Ew şanda



Kurdistanê de li ser nakokiyên di navbera Hewlêr û Bexdayê de bikole, ku bûne sedema neşandina buce û mûçeyên Herêma Kurdistanê.

Herwiha de pirsgrêkên taknîkî yên petrolê werin gotûbêj kirin bo çareserkirina wan." Ebdulah ragihand: "Ew serdan jî bi bandor bo çareserkirina arîseyan û şandina pişka Herêma Kurdistanê ji budceya Iraqê da zanîn. Tê çaverêkirin ku vêheftayê 583 milyar dînanan ji budceyê meha 1ê ji Herêma Kurdistanê re bişîne."

Aktar: Hewildanên jibo tifaqa Kurdan erênî ne

Mehmet Emîn Aktar: Mafê Kurdan yê tayînkirina qedera xwe ne bijardeyeke beramberê hilibijartinan e. Divê biryara me ya diyarkirina çarenivîsê di destê me de be. Piştî ku Partiya Demokratîk ya Gelan (HDP) biryar da, bi serê xwe beşdarî hilibijartinê giştî ya parlemena Tirkîyê ku li 7'ê meha 6 pêk tê bibe, lêgerîn û danûstandinê tifaqê jî li nav partî û dezgehên Kurdî destpê kirin.

Şandeyên HDP, DBP, KCD û dezgehên sivil ev demeke jibo tifaqê serdanên şewrê li partî û bizavên Kurd dikin. Partî û bizavên mîna; Partiya Azadiya Kurdistanê (PAK), Partiya Demokrasiya Beşdar (KADEP), Komela Demokrat ya Kurdên Şorger (DDKD), Platforma

Demokratên Kurd (PDKN), Partiya Demokrata Kurdistanê-Tirkîye (PDK-T) û Hereketa Azadî, ligel çend dezgehên sivil jibo tifaqa hilibijartinê di nav danûstandinên siyasî de ne.

Serokê Baroya Amedê yê Berê Parêzer Mehmet Emîn Aktar ku bi salan e siyaseta Kurd ji nêz ve dişopîne, lêgerîn û hewildanên tifaqa Kurdan ya hilibijartinê ji Dengê Amerîka re nixrand.

"Hewildanên jibo tifaqa Kurdan erênî ne, lê armanca tifaqê divê ne tenê derbaskirina benda sedî 10 ya hilibijartinê be. HDP benda hilibijartinê derbas bike bi vê tenê nikare pîrsa Kurd çareser bike. Bi bawerîya min, ger HDP li bin bendê bimîne dibe ku jibo gelê Kurd baştir be."

Birêz Aktar, gotinên Şaredarê Mêrdînê Siyasetvan Ahmet Türk ku demek berê gotibû, 'Ger HDP bendê



derbas neke, Kurd dikarin çarenivîsa xwe diyar bikin' wiha şîrove kir.

"Mafê Kurdan yê tayînkirina qedera xwe ne bijardeyeke beramberê hilibijartinan e. Divê biryara me ya diyarkirina çarenivîsê di destê me de be." (dengeamerika.com)

Hêzên Pêşmerge li eniyên Mexmûr û Xazirê bi tundî bersiva DAIŞê dan..Şerekî giran bû



Mexmûr-KDP.info- Derengiya şevê din, terosîrên DAIŞê li eniyên Xazir û Mexmûrê êriş kirin ser çeperên Pêşmerge, lê Hêzên Pêşmerge bi tundî bersiva herdu êrişan dan û êrişên wan hatin tîkbirin. Eqîd Nazim Herkî Fermandarê Fewca 1 ya liwaya 10 ya Hewlêrê ji malpera KDP.info re ragihand: "Terorîstên DAIŞê li Qereçûx û kaşên Darebizmare yên ser gundên Geraw yên nêzikî eniya Dûbiz êriş

kirin ser çeperên Pêşmerge, lê Hêzên Pêşmerge bi qehremanî bersiva wan dan û heta vê sibehê şer berdewam dikir û di encamê de hatin şikestin."

Hevdem Emîd Salar Cebare Ehmed fermandarê Hêza 1 ya ya Zêrevanî li eniya Xazir ji malpera PDKê re ragihand: "Seat 3 û niv terorîstên DAIŞê li gundê Werdekê yê eniya Xazirê êriş kirin ser çeperên Pêşmerge, ku qezenc ji keş û hewayê dîtin, lê hêzên Pêşmerge bi çekên giran bi tundî bersiva wan dan û ew şikenandin."

Derbarê ziyanên wan terorîstan, herdu fermanderan tekez kirin ku çekdarên DAIŞê gellek ziyan dîtin.

Keskê.. 30 termên DAIŞê li cihê şer man..Rastî bersiveke tund hatin

Keskê-KDP.info- Fermandarê Fermandeya Dihokê dibêje, derengiya şevê din Hêzên Pêşmerge li 2 gundên sînorê Keskê êrişeke terorîstên DAIŞê tîk birin, ku 30 termên wan li cihê şer mane.

Emîd Kamil Herkî Ji Fermandeya Dihokê ji malpera KDP.info re ragihand: "Seat 02:30 vê sibehê, terorîstên DAIŞê bi şofel û çend otomobîlên hamar êriş kirin ser çeperên Pêşmerge li gundên Telrîm, Cemrûd li sînorê

Keskê, lê di demeke kurt de ji aliyê Hêzên Pêşmerge ve hatin şikestin."

Herkî wiha domand: "Di encama şikestina wan terorîstan de, ew şofel û 3 hemerên wan hatin tîkbirin, herwiha 3 laşên wan li cihê şer mane."



Serok Barzanî vegeriya Başûrê Kurdistanê

Hewlêr-KDP.info- Piştî serdaneke fermî bo Ewropayê, Serok Barzanî bi rêya Balafirgeha Navdewletî ya Hewlêrê vegeriya Herêma Kurdistanê. Êvriya îro şemî 14/02/2015 Mesûd Barzanî Serokê Herêma Kurdistanê dawî bi serdana xwe ya Ewropa anî û li rêya Balafirxaneyê Navdewletî ya Hewlêrê gihîşt paytexta Herêma Kurdistanê.

Hêjayî gotinêye Serok Barzanî li ser vexwendineke

fermî ya ji bo beşdarîkirina li Konferansa Asayîşa Cîhanî li Munîx serdana Ewropa kir û li demên konferansê jî ligel hejmarek berpirs û siyasetmedarên welatên cîhanê hevdiştin pêkanî û piştî temambûna konferansê jî serdana welatê Fransa kir û ligel Serok û berpirsên mezinên Fransa civiya. Her wiha welatê Awusturya wêstgeha dawî ya serdana Serok Barzanî bû û li wir ligel Serokê Awusturya civiya.

Şanda herêmê gihêste Bexdadê

Îro 15/2/2015 danê pêş nîvro bi serokayetiya serokê hikûmeta herêma Kurdistanê gihêste Bexdadê. Mebesta serdana



şanda herêmê ji bo çareserkirina pîrsgirkên şandina nefta herêma Kurdistanê û çend pîrsêkî dinê ne. Jêderêkê taybet ji PUKmedia'yê re ragihand: Biryare îro şanda hikûmeta herêmê li gel serokwezîrê Êraqê Heyder Ebadî bicive û goftûgo li barê çareserkirina şandina 550 hezar bermilên neftê di yek rojê de ku biryare li gor rêkeftinnameyekê hikûmeta herêmê ji nefta herêmê û Kerkûkê bişîne Bexdadê bikin.

Kadrî Yildirim ji HDPê dibe namzed

Rêvebirê Enstituya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Artukluyê Prof. Dr. Kadrî Yildirim ji bo ji HDPê bibe namzed dest ji karê xwe berdide. Li gorî agahiyên Rûdawê Prof. Dr. Kadrî Yildirim dê îro dest ji karê xwe berde û dê ji bo namzedeya parlamenteriyê serlêdanê li Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) bike.

Desteya hilbijartinê ya HDP, piştî serlêdana kesên ku bixwazin bibin namzedê biyara xwe bide ka kê hilbijere. Hêj ne diyare Yildirim dê ji Kîjan bajarî bibe namzed. Herwiha tê gotin ku dê ji bo namzediya parlamenteriyê hinek mamosteyên din ên zanîngehan serlêdana HDPê bikin.



“Hevdîtinên me bi PKK re berdewam in”

AVESTA KURD - Serokwezîr Nêçîrvan Barzanî di hevpeyvîneke xwe de, behsa pêwendiyên ligel PKK kir û got hevdîtin û pêwendiyên wan bi PKK re berdewam dikin. Barzanî got, karê PKK ne li herêma Kurdistanê ye û divê ew vê yekê bizanibe, parastina herêma Kurdistanê karê hikûmeta herêma Kurdistanê ye, ne karê PKK ye. Serokwezîr got, pêwendiyên wan ligel PKK pêwendiyên normal in, dibe ku li ser hinek meseleyan



nêrînên wan cuda bin, lê weke du hêzên siyasî pêwendiyên wan û hevdîtinên wan ligel PKK hene, her wiha danûstandinên wan berdewam hene. Barzanî got, saheyan wan û PKK di xebatê de cuda ye. Her wiha diyar kir ku ew berpirsiyariya herêma Kurdistanê dikin, divê PKK vê yekê têbigihê, bi tu awahî PKK ne berpirsiyarê herêma Kurdistanê ye, ne mesûliyeta wê ye. Em li hember herêma Kurdistanê îraqê berpirsiyar in.


Cemîl Bayik: Dem hatiye PKK ji lîsteya ‘terorê’ bê derxistin

Hevserokê Konseya Rêveber a KCK'ê Cemîl Bayik da xuyakirin ku dem hatiye PKK ji lîsteya ‘rêxistinên terorîst’ bê derxistin. Bayik teqez kir ku îro ji bilî PKK'ê ti hêz îro ew çend bi xurtî li dijî terorîzmê şer nake.

Cemîl Bayik, di peyama xwe a bi dîmen de ku ji mîtinga li Strasbourgê ya ji bo şermezarkirina komploya navneteweyî li dijî serokê PKK Abdulah Ocalan şand û têde Bayik ragihand ku gelên Ewropayê û tevahiya cîhanê li dijî ragirtina navê PKK'ê li lîsteya ‘terorê’ ne û destnîşan kir ku divê hikûmet û

dewletên Ewropayê û saziyên navneteweyî guh bidin vî dengê gelên xwe. Hevserokê Konseya Rêveber a KCK'ê Cemîl Bayik hilbijartinên giştî yên li Bakurê Kurdistanê û Tirkîyeyê yên meha Hezîrana vê salê bibîr xist û diyar kir ku ew hilbijartin wê çarenûsa gelan diyar bike.

Bayik got, “Li Tirkîyeyê AKP faşîzma kesk dewam dike, dixwaze zîlmê dewam bike û piştî bi destxistina serketinê di hilbijartinê de li Tirkîyeyê şerekî mezin bide destpêkirin. Di hilbijartinan de yan ev ê pêk were yan jî wê Tirkîye demokratîk û azad bibe.”



Neviyê Şêx Seîd: Bila gorra Şêx Seîd were eşkerekirin

Di 90emîn salvegera Serhildana Şêx Seîdê Pîran de, bang li dewleta Tirk hat kirin

bi helkefta salvegera serhildana Şêx Li ser navê Komelaya Şex Seîd, neviyê



ku gorra wî were eşkerekirin. Komeleya Şêx Seîd li Diyarbekirê li Qada Şêx Seîd

Şêx Seîd, Şêx Qasim Firat ragihand ku ew ji bo bîranîna berxwedan û serhildana Şêx

Seîd û ji bo parastina gelê Kurd û Kurdistanê li hev civiyane. Di roja bîranîna serhildana Şêx Seîd de endamên Komeleya Şêx Seîd li Qada Şêx Seîd li hev civiyan. Li Qadê Şêx Seîd li ser navê Komeleya Şêx Seîd neviyê Şêx Said Şêx Qasim Firat axivî. Firat da zanîn ku kadroyên rêxistina Azadiyê ji bo parastina mafê Kurdan û di 13 Sibata 1925'an de rêxistina xwe ya netewî avakirine û dest bi serhildanê kirine. Şêx Qasim Firat, herwiha xwest hêz û kesên destê wan di darvekirina Şêx Seîd û hevalên wî de heye bête eşkere kirin û ji bo vê yekê komîsyonek bê

damezirandin û cihê gorên Şêx Seîd û hevalên wî bête aşkere kirin.

Firat axaftina xwe wiha bidawî kir: “Em daxwaz dikin ku rastiyan dîrokî yên berxwedana 1925'an bête eşkerekirin, di serî de Tirkîye û bi giştî hemû hêzên herêmî û yên navneteweyî yên ku berpirsiyariya wan di vê bûyerê de heye ji gelê kurd lêborîne bixwazin. Ji bo hemû mafên kurdan ên madî û manevî yên ku hatine desteserkin bête radeshtkirin û tanzîmkirin komîsyoneke lêgerîna rastiyan bê damezirandin. Û em dixwazin gora şehîd Şêx Seîd û hevalên wî ji malbatên wan re bê dayîn.” (BasNûçe)

Kobanê.. 2 cihên girîng hatin azadkirin

Kobanê-KDP.info- Hêzên kurdî 2 navçeyên herî girîng li başûrê bajarê Kobanê yê Rojavayê



Kurdistanê ji çekdarên DAÎŞê paqij kirin, çavkaniyek ji Pêşmerge jî dibêje ku ew berdevamî di pêşdeçûna xwe de. Fermandarê Hêzên Pêşmerge li Kobanê Neqîb Rizgar Behram Şêrwanî ji malpera KDP.info re ragihand: Şeva borî şervanên Kurd û Hêzên Pêşmerge 2 navçeyên girîng ên bajarê Kobanê yê Rojavayê Kurdistanê li ser çemê Firatê ji DAÎŞê paqij kirin. Neqîb Rizgar Behram wiha got: “Şervanên Kurd û Hêzên Pêşmerge, êrîşeke berfireh bo ser gundên Sêwe, Ebtar û Tormanê encamdan û li demjimêr 10 şeva borî, karîbûn wan gundan ji çekdarên DAÎŞê pajibikin.” Derbarê girîngiya wê navçeyê de Neqîb Rizgar Behram diyar kir ku “Ew gund bi qasî 30 kilometran ji bajarê Kobanê dûr in û dikevine ser çemê Firatê û navçeyên herî girîngin li başûrê Kobanê.” Derbarê pêşdeçûnan de jî Neqîb Rizgar Behram da zanîn ku “Em û şervan di pêşdeçûnên berdevam de ne ji bo azadkirina tevahiya gundên di destê çekdarên DAÎŞê de û li her cihêkî pêwîst bû bi alîkariya şervanan wê pêgehên DAÎŞê topbaran bikin.”

Şingal.. Hêzên Pêşmerge dîsa li DAÎŞê dan..9 terorîst kuştin

Şingal-KDP.info- Vê êvarê çekdarên DAÎŞê li Şingalê êriş kirin ser çeperên Pêşmerge, lê Hêzên Pêşmerge her zû bi tundî bersiva wan dan û ew neçar kirin ku paşde bixşên, ku di wî şerî de 9 terorîst hatin kuştin. Fermandarê Hêzên Pêşmerge li Şingalê Haşim Sîteyî ji malpera KDP.info re ragihand: “Îro danê êvarê, çekdarên DAÎŞê ji nava taxên Şingalê êriş kirin, lê ji ber ku cihên stratejîk di destê Hêzên

Pêşmerge de ne, her zû Pêşmerge bi tundî bersiva wan dan û êrişa wan tîk birin û wan terorîstan gellek ziyar dîtin.”

Haşim Sîteyî wiha got: “Di wê êrişê de 9 çekdarên DAÎŞê hatin kuştin û hejmarek birîndar jî bûn. Herwiha çendîn otomobîlên wan jî ji aliyê Hêzên Pêşmerge ve hatin tîkbirin û termê 5 çekdarên wan li cihê şer man.”



Îro 16 - salîya salvegera girtina Ocalan e

Serokê PKK Abdullah Ocalan di 15.02.1999 de li Kinya hatibû girtin


Zarokatîya wî

Abdullah Öcalan, di 1949an de li gundê Amara yê navçeya RihaXelfetiyê hat dinê. Dibistana seretayî li Cîbînê xwend û hê di wê demê de di lîstîk, limêj û parvekirinê de pêşengî dikir. Dibistana navîn li Nizîpê dibistana navîn jî li Enqerê li dibistana navîna Tapu Kadastro qedand. Di 1969'an de li Amedê dest bi karmendiyê kir. Di karmendiya salekê de têkiliya dewlet û civakê û ya sistema feodal û dewletê ji nêz ve dît. Di 1971ê de tayîna xwe deranî Stenbolê û li wir di ber karmendiyê de xwe amade dikir ku bikeve zanîngehê jî. Heman sal qeydiya xwe li fakulteya hiqûqê çêkir û dev ji karmendiyê berda.

Destpêkê jiyana wî ya siyasî

Di wan salan de Stenbol di bin tesîra bayê 68an de bû. Ocalan jî kete bin bandora vî bayî û Marksîzm - Lenînîzm nas kir. Ew salana weke salên werçerxa jiyana wî ne û her wiha ew sosyalîzm, yeksanî û azadî pir nêzî xeyalên xwe yên zarokatîyê dîtin. Ocalan biryar dabû ku sosyalîzm û pîrsgirêka

kurd li hev biguncîne. Bi vê armancê bîryar da ku dest bi siyaseta çalak bike û qeydiya xwe li fakulteya zanîngên siyasî ya Enqerê çêkir. Li vê derê xwe



di nav atmosfereke tund a guftugoyan de dît û şeklek da ramanên xwe. Di 30yê adara 1972yan de pêşengên şoreşê Mahir Çayan û hevalên wî li Qizildereyê hatin kuştin û vê bûyerê şopên kûr di jiyana ramanên wî de de hiştin. Di 7ê nîsanê de di çalakîya şermezarkirina bûyera komkujîyê de hat binçavkirin û şandin

girtîgeha Mamakê. 7 meh di girtîgehê de ma û di wê pêvajoyê de xwe gihand fikra avakirina rêxistinekê û ji bo vê yekê gav avêt nav pêvajoyeke din a

dixe û bîryar dide ku li Kurdistanê xebatê bimeşîne.

Avakirina PKK

Di 27'ê mijdara 1978'an de jî Ocalan û hevalên xwe li Amedê li gundê Fîsê yê Lîceyê careke din li hev kom dibin û bîryara avakirina Partiya Karkerên Kurdistanê didin. Xebatên rêxistinkirinê yên Ocalan û Partiya ya wî PKK yê li Kurdistanê di demeke kin de bala dewleta tirk kişand. Li ser vê şeweya nû ya Ocalan a li hemberî pîrsgirêka kurd ku zikê nerm ê Tirkîyê bû, dewleta tirk zextên xwe zêde kirin. Dewletê bi awayekî vekirî li hemberî terza Ocalan şer dida destpêkirin û ji ber vê yekê Ocalan di 1979an de derket derve û çû Libnanê. Bi vî awayî meşa ku wê 20 salan li rojhilata navîn berdewam bikira, dest pê kir. PKKê li Libnanê di 1982yan de kongra xwe ya duyem pêk anî û bîryara vegera nava axa welat wergirt. Milîtanên PKKê di bin pêşengiya Öcalan de perwerdeya xwe ya îdeolojîk û leşkerî jî temam kiribûn. Di encamê de di 15ê tebaxa 1984an de li bakurê Kurdistanê şerê çekdarî destpê kir. Ji wê gavê û şûn ve êdî pîrsgirêka kurd

bi hemû dişwariya xwe di rojeva cihanê de ye.

Girtina wî

Di encama şerê çekdarî de li ser daxwazên ku ji Tirkîyê tên, ji 1993an û şûn ve PKKê 3 caran agirbest îlan kir. Ev gavên ku ji bo çareserkirina pîrsgirêka kurd hatin avêtin, rastî kelem û astengiyên derdorên rentxwîr hatibûn. Di 9ê dotmeha 1998and e di encama komployeke ku bi hevkarîya hêzên navnetewî hat amadekirin, Ocalan neçar ma ku ji Suriyê derkeve. 9ê cotmehê de Ocalan dema dest bi rêwîtiya ber bi Ewropa kir wê wiha bigota: Ez ji niha û şûn ve dixwazim rola xwe di kanala siyasî de bilîzim. Ocalan dema li Îtalya bû gelek caran bangên ji bo aştîyê kirin lê belê ji yekîtiya ewropa hêviya ku dikir bi dest nexist. Ocalan di 2yê sibata 1999an de bi zordayîna Yewnanîstanê heta Kenyayê diçe. Di 15ê sibata heman salê de jî li paytextê Kenya Nayrobiyê li pêşiya avahiya sefaretxana Yûnanîstanê bi komployeke navnetewî ber bi Tirkîyê ve tê revandin. Serokê giştî yê PKKê Abdullah Ocalan li girava Îmralî ya li nav derya Marmarayê bi tena serê xwe di girtîgehê de hat bicihkirin. Ocalan li Îmraliyê girtiye. **Jêder: Wikipedia**

Dewletbûn Mafê Miletê Kurd e. Swêdê Jî Ev Rastiya Diyar Kir...

Miletê Kurd li Rojhelata Navîn, ji aliyê serhejmar de Piştî Ereban miletê duyemîn e. Serhejmara miletê kurd li Rojhelata Navîn wek tê diyar kirin, 30 milyon nîn e, zêdetir e.. Serhejmara kurdan, 50 milyon e. Eger bi taybetî li Tirkîyeyê, lê li Iraqê, li Îranê û li Sûriyeyê kurdên hatine, asîmîle kirin, bûne tirk, ereb, fars jî bê hesab kirin, serhejmara kurdan ji 50 milyonî jî zêdetir dibe.

Miletê kurd jî, wek miletê faris û ereb, miletê herêma ya Rojhelata Navîn e. Tirk jî derbve de hatine Rojhelata Navîn. Loma jî Kurd miletekî xwediyê dîrokek gelek dirêj e ku li Rojhelata Navîn miletekî rûniştvan, medeniyet/şaristanîçêker e. Hezar mixabin îdeologên dewletên metîngehkar (kolonyalist), îdeologên nijadperest yê tirk, farisan û ereban, wek hemû rastiyên me, ev du rastiyên miletê kurd yê min diyarkirî jî bincil, tune, înkâr kirine.

Îdeologên dewletên kolonyalist, gelek bi rû reşî û bi helwestek neilmî û neînsanî hebûna miletê kurd, hebûna zimanê kurd û hemû hêjayiyên kurdan înkâr kirine.


Lê hêjayiyên miletê kurd yê

xûrt û qewî; têkoşîna rîzgarîxwaz ya miletê kurd her dem ew îdeolog û pisporên miletê serdest û kolonyalist, dewletên dagirker û nedemokrat derewîn derxistine.

Kurdan, her dem hêjayiyên xwe, di serî de jî zimanê xwe û welat/axa xwe bir fedekarî parastine. Van salên dawî jî, ji derveyî helwesta PKKê her dem desthilatdariya xwe bi awayê federalî, konfederalî, dewleta serbixwe jî bona xwe kirine stratejî.

Di vê merheleyê de jî kurdan dev ji ev daxwaza xwe bernedana. Kurd piştî salên 1990î yanî piştî şerê sar û bitaybetî jî piştî sala 2003-an ku rejîma baasê li Iraqê hat hilweşandin, kurd nêzikî desthilatdarî û dewleta serbixwe bûn. Loma jî dema ku Malîkî siyasetek nasjonalîst û nijadperest ya ereban meşand, li Başûrê Kurdistanê dewletbûna serbixwe û konfederal ket rojevê. Ji bona dewleta konfederal jî, pêşî dewletek serbixwe pêwîst e. Loma Kurdan ji bona dewletek serbixwe li hûndirê welêt û li derveyî welêt dest bi xebatê kirin.

Hezar mixabin dewletên kolonyalist û hevalbendên wan, ji bona ku pêşiya dewletbûna kur-



İbrahim GUÇLU
ibrahimguclu21@gmail.com

dan bigrin, erîşa DAÎŞê rêxistin. Hîn jî ev erîşa DAÎŞê li Başûrê Kurdistanê û li Rojavayê Kurdistanê dom dike. Li Başûrê Kurdistanê şerekî diwar heye.

Lê wî şerî kurd jî dewleta serbixwe û konfederal dîrnexist, nêzikî dewleta serbixwe kir. Lewra kurdan li herêmên ji derveyî desthilatdariya Kurdistanê jî bi cî bûn. Di vê merheleyê Emerîka û Dewletên Yekîtiya Ewropayê bi her awayî piştigiriya hikûmeta Kurdistanê dikin.

Rojavayê Kurdistanê jî, ji dewletbûnê ne dûr e. Lê hezar mixabin PKK/PYDê li dijî dewletbûnê derdikeve.

PKK/PYDê di heman dem de li dijî dewletbûna Başûrê Kurdis-

tanê û beşên din jî derdikeve. Heta ji dewletên dagirker zêdetir PKK, li dijî dewletbûna kurdan şerekî îdeolojîk û siyasî dimeşîne.. Eger derfet bibînin dê bi çekdarî jî pêşî li dewletbûna kurdan bigre. Siyaseta wan ya di derbarê Kerkukê û Şengalê de jî vê yekê gelek baş aşkere dike.

Li Başûrê Kurdistanê xebata dewletbûnê dom dike. Hemû dinya û dewlet jî vê xebatê dizanin û dişopînin.

Serokê Kurdistanê Mesud Barzanî di van rojên dawî de li Ewropayê bû. Di hevdîtinan de mijarek girîng ya hatiye gengeşî kirin jî, dewletbûna kurdan e.

Wek tê zanîn li Emerîka û li Ewropayê dewlet nebin jî, dezgehên gelek girîng yê nêzikî hikûmetan; parlamenter, senator, lord, nivîskar û hûnermendên bi navûdeng dewletbûna kurdan diparêzin. Di van rojên dawî de hikûmeta Swêdê jî diyar kir ku "dewletbûn mafê kurdan e. Divê kurd jî bibin dewlet."

Wek tê zanîn Swêdê wek dewlet her dem ji kurdan re dostanî kiriye. Himbêza xwe ji rewşenbîr û siyasethavên kurd re vekiriye. Swêdê derfet çêkiriye

ku bi giştî çanda kurdî û bi taybetî jî zimanê kurdî pêşbikeve. Loma jî perwerdayî kiriye û mamoste perwerde kirine. Li Swêdê wêje, ziman, edebiyad û xebata entelektuelî ya kurd derfet dît ku pêş bikeve.

Li Swêdê gelek kurd jî di dezgehên dewletê de xwediyê cîyekî baş in. Di parlamentoya Swêdê de kurdên parlamenterî kirin hene û nûha jî yê dikin hene. Di şaredariya û komunan de gelek kurd desthilatdar in.

Biraziya min Roza Guçlu jî du dem in ku li Swêdê parlamentera Partiya Sosyal Demokratana e. Ji partiya wezîrê derve Margot Wallstrom e.. Di vê merheleyê de ji aliyê Hikûmeta Swêdê de diyar kirina dewletbûna kurdan ji bona Roza û parlamenterên kurd yê din jî bextewarî û serkeftinek e.

Wezîrê Derve Ya Swêdê Margot Wallström dibêje ku "ji bona dewletbûna kurdan dem hatiye. Divê êdî dewletbûna kurdan bê gengeşî kirin. Me wek welatê Swêdê çawa piştigiriya dewletbûna Filîstîniyan kiriye, divê em piştigiriya dewletbûna kurdan jî bikin." Ez jî dibêjim ku dema dewletbûna kurdan hatiye. Divê her kurdek jî bi vê yekê bawer bike û ji bona dewletbûna kurdan xebat bike.

Amed, 14. 02. 2015



Yekitiya Ewropayê biryar da çekan bide hêzên Pêşmerge

Ajans-KDP.info- Yekitiya Ewropayê ragihand, dê di şerê li dijî DAÎŞê de çekan bide hêzên Pêşmerge her wiha ji bo şandina alîkariyên mirovî ji kurdên êzîdî yê li ser çiyayê Şingalê asê mane, pireke hewayî çêbike û firotina petrolê ji aliyê DAÎŞê ve asteng bike. Wezîrên derve yê Yekitiya Ewropayê îro li ser rewşa Iraq-Başûrê Kurdistanê û Rûsyayê bi awayekî awarte li Brukselê

civîyan. Di civînê de êrişên DAÎŞê li dijî kurdên êzîdî û gelên din ên Iraqê bi tundî hat şermezarkirin û hinek biryarên girîng hatin standin. Li gorî agahiyan, wezîrên Yekitiya Ewropayê pêşwazî li biryarên welatên mîna Îngiltere, Fransa û Hollandayê bo şandina çekan ji hêzên Pêşmerge yê Başûrê Kurdistanê re kirin û ragihandin, divê ev çek li gorî qanûnên Ewropayê û bi rizamendiya

hikûmeta Bexdayê werin şandin.

Yek ji biryarên din ên wezîrên Ewropî astengkirina firotina petrolê ji aliyê DAÎŞê ve bû û li ser vê yekê jî bi awayekî berfireh hat gotûbêj kirin. Her wiha biryar hat dayîn ji bo şandina alîkariyên mirovî bo kurdên êzîdî yê li ser çiyayê Şingalê asê mane pireke hewayî bê çêkirin û alîkarî ji wan re were şandin.

Van halkı 15 Şubat Komplosu'nu Protesto Etti

"PKK Lideri Abdullah Öcalan'a yönelik gerçekleştirilen Uluslararası 15 Şubat Komplosu, 16. yılında Van'da düzenlenecek kitlesel basın açıklaması ve yürüyüşle protesto edildi."

Fekiy Teyran Parkında Kitlesel protesto yürüyüşüne HDP Milletvekili Özdal Uçer, DBP Van İl Eş Başkanı Hamiyet Şahin, HDP Van İl Eş Başkanı Veysi Dilekçi, Derya Hayva, Van TUYAD- DER Başkanı Ahmet Aygün, Barış Anneleri Meclisi ve Özgür Kadın Kongresi (KJA) aktivistleri katıldı.

"15 Şubat uluslararası komployu nefretle kınıyoruz" pankartı ile Öcalan'ın posterlerini taşıyan kitle sık sık, "Bijî Serok Apo" ve "Bê Serok jiyan nabe" sloganları attı. Fekiy Teyran Parkında yapılan basın açıklamasını okuyan HDP Van İl Eş Başkanı Derya Hayva " Bundan 16 yıl önce 15 Şubat 1999 da tüm Kürdistan Türkiye ve ortadoğu halkları güne kara bir haberle uyandı. Abdullah Öcalan'ın uluslararası bir komployla hukuka aykırı bir şekilde korsan varı yöntemlerle Türkiye'ye getirildi. Bu yüzden halkımız her 15 Şubatı kara gün olarak protesto ediyor. Komployu gerçekleştirenlerin amacı Abdullah Öcalan şahsında Kürt hareketini

tavsiye etmek ve Türkiye halkları arasında uzun yıllara yayılacak bir boğazlaşmayı başlatmaktı dedi. Hayva, Abdullah Öcalan 1993 çözüm ve diyalog arayışlarına İmralı'dan yeni bir hamleyle barış

bunu gören Kürt halkı ve tüm halklar Abdullah Öcalan'ın etrafından bir direniş zinciri oluşturarak Önderliğine ve mücadelesine sahip çıktı. Tek kişilik hücrelerinde yıllarca barış mücadelesi



sürecine çevirerek egemen güçlerin oyunun bozdu. Başlatılan yeni süreçle hesapları bozulan egemen güçler Abdullah Öcalan üzerinden uzun yıllardır süren tecrit ve izolasyon politikasını başlattı. Zehirlenmedin tutunda fiziki saldırıya kadar her türlü yöntem uygulandı. Ancak

veren Abdullah Öcalan'ın bu çabalarına devletin verdiği karşılık ise yoğun askeri ve polisiye operasyonlar oldu. Yıllarca ellerinden gelen tüm savaş tekniklerin kullandılar. Ama bu güçler Öcalan'ın yeşerttiği özgürlük umutlarının geldiği noktayı hesap edemediler. Hayva "Öcalan başlat-

